

ÇAVDÊRIYA MEDYAYÊ YA BIAYÊ

NIRXANDINA 20 SALÊN

AZADIYA MEDYAYÊ

2001-2021

ULAŞ  
KARAN

# NIRXANDINA 20 SALÊN AZADIYA MEDYAYÊ 2001-2021

Ulaş Karan<sup>1</sup>

## NAVEROK

Destpêk	...	<b>3</b>
<b>I.</b> Bi rengê giştî azadiya xweîfadekirinê û naveroka raporê	...	<b>5</b>
<b>II.</b> Aktorên di sîordarkirina azadiya xweîfadekirinê de derdikevin pêş	...	<b>11</b>
<b>III.</b> Mînakên di sîordarkirina azadiya xweîfadekirinê de derdikevin pêş	...	<b>20</b>
<b>IV.</b> Bîlanço	...	<b>32</b>
Jêr notên	...	<b>37</b>



Ev weşan di çarçoveya "Bernameya YE Etkiniz" de, bi piştevaniya Yekitiya Ewropayê pêk hatiye. Ji naveroka vê weşanê tenê NAVÊ KOMELİYÊ berpirsiyar e û bi ti awayî fikrên Yekitiya Ewropayê temsîl nake.

## Destpêk

Nîqaşên 20 sal in li Tirkiyeyê li ser naverok û çarçoveya azadiya xweîfadekirinê tên kirin, bi mirov didin hiskirin ku em her serê sibê çavê xwe ji heman rojê re vedikin. Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (DMME) Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (DMME) di destpêka sala 2022yê de hin dane weşandin. Li gorî van daneyan, di navbera salên 1959 û 2021ê de 47 welatên Peymana Mafên Mirovan a Ewropayê (PMME) îmze kirine bi giştî hezar û 10 mafên mirovan bînpê kirine. DMMEyê bi tenê ji bo Tirkiyeyê 418 biryarên bînpêkirinan daye (nêzîkî ji sedî 41ê biryaran). Ev dane û îstatîstîkên fermî yên ku dewletê weşandine, qet nebe di vê mijarê de rewşa heyî ji hêla îstatîstîkan diyar dîke.<sup>2</sup> Dadgeha Destûrî di 23yê Îlona 2012ê de rê li ber serlêdanên şexsî vekir. Ji wê rojê heta dawiya sala 2021yê, Dadgehê di 663 serlêdanan de biryar da ku mafên azadiya

xweîfadekirinê hatine bînpêkirin. Dema ev vê jî li wan îstatîstîkên din zêde biken, em ê bibînin ku pirsgirêk ne akût lê kronîk e.<sup>3</sup> Raporên ku rêxistinên civaka sîvîl di qada netewî û navnetewî de diweşînin û raporên pêşketinê yên Yekitiya Ewropayê amade dikin jî vî tiştî piştrast dikin û balê dikişînin ser berdewamiya pirsgirêkê. Azadiya xweîfadekirinê ew mijara ku di vê astê de berbelav e û ji rojevê dernakeve, nîşan dide ku saziyên fermî û aliyên sêyem gotinên tên kirin "metirsîdar" penase dikin. Divê mirov bibêje, azadiya xweîfadekirinê mafêke ku ji xwe ji bo ramanên hin kesên din wan "metirsîdar" bibînin derketiye holê.

Gelek maf di bin banê azadiya xweîfadekirinê de hene û têkiliyeke rasterast di navbera wê û demokrasîyê de heye. Di vê çarçoveyê de, hebûna mafî, ji bo demokrasîyê, li gel hin şert

û mercên din şertekî bivê nevé ye. Her weha li welatekî rewşa azadiya xweîfadekirinê ji bo rewşa demokrasîyê mîna kaxiza turnusolê, li şûna veqetînekê tê bikaranîn. Li gorî DMMEyê jî azadiya xweîfadekirinê mafekî wisa ye ku têkiliyeke wê ya xurt bi demokrasîyê re heye: “[Azadiya xweîfadekirinê] yek ji hîmên bingehîn ên civaka demokratîk e ku ji bo pêşketina civakê û her mirovî şertekî esasî ye. Azadiya xweîfadekirinê, [...] ne tenê ji bo hizr û zanyariyên li dij an jî bêziyan an jî hewce nake mirov serê xwe pê biêşîne, her weha ji bo hizr û zanyariyên ku li gorî dewlet an jî beşeke civakê ew êrîşkar in, ji ber wan matmayî dimînin û nerihet dikin jî tê bikaranîn. Ev tişt ji bo piranîparêziyê, xweşbîniyê û rastgoyiyê pêwîst in, bêyî vana civaka demokratîk nabe.”<sup>4</sup>

Di vê lêkolînê de, em li gorî Raporên Çavdêriya Medyayê yên BIAYê, rewşa azadiya xweîfadekirinê ya 20 salên Tirkiyeyê ji hêla saziyên medyayê û rojnamegeran dinirxînin ku Erol Onderoglûyî ev rapor di navbera 2001ê û 2021ê de, her ji sê mehan carekê amade dikir û bianetê ew diweşandin.<sup>5</sup> Raporan di serî de bi tenê behsa dezgehên çapemeniyê yên klasîk di nava

xwe de dihewand, lê bi pêşketina teknolojiyên ragihandirê re, rojnamegeriya înternetê jî ketiye nava sînorîn raporê. Ji ber vê yekê, divê bê gotin ku raporên navborî di heman demê de lêkolîneke dîrokî ya 20 salên dawî ya dezgehên medyayê yên li Tirkiyeyê ye. Ev rapor bi tenê balê dide ser saziyên medyayê û rojnamegeran. Ji ber wê jî behsa gelek mijarên têkildarî azadiya xweîfadekirinê nehatiye kirin. Rapor bi armanca ku derbarê 20 salên dawî de kurteyekê pêşkêşî xwendekaran bike hatiye amadekirin. Ji ber wê jî mixabin behsa hin bûyer û mijaran nehatiye kirin. Divê ev rewş nebe sedema wan şîroveyan ku weke mijar an jî bûyerên me negirtine dest, ne girîng in an jî ev mijar ji bo azadiya xweîfadekirinê ne girîng in an jî pirsgirêkên heyî yên derbarê azadiya xweîfadekirinê, bi tenê bi bûyerên ku di raporê de hatine nivîsîn, sînordar in.

## I. Bi rengê giştî azadiya xweîfadekirinê û naveroka raporê

Beriya her tiştî divê were zanîn ku ji bo kesên wê mafên xwe yên azadiya xweîfadekirinê bikar bînin, ferq û cewazî nîne bê ew kesen rast/kesên hiqûqî ne (komele, weqif, partiyên siyasî, sendîka hwd) an jî welatî/biyanî ne. Azadiya xweîfadekirinê<sup>6</sup> ji bo her kesî ye Nasnameya kesekî/ê ne ji aliyê bikaranîna mafî lê ji aliyê sînordarkirinê ve girîng e. Neqanûnî ye ku ji ber şexsiyeta wan midaxele li kesan bê kirin û nehêlin ew hizrên xwe bînin ziman û wan belav bikin, ev dibe li dijî hiqûqê bê qebûlkin.<sup>7</sup> Mînak, girtiyên li girtîgehên ewlehiya wê xurt tîn girtin, leşker<sup>8</sup>, karmendên dewletê<sup>9</sup>, xebatkarên<sup>10</sup> Serokatiya Karûbarên Diyanetê<sup>11</sup> jî tê dehemû kes dikarin mafê xwe yê azadiya xweîfadekirinê bikar bînin. Nasnameyhen van mirovna nabe asteng li ber bikaranîna vî mafî, bi tenê ji hêla sînorkirina azadiya xweîfadekirinê karîger dibin. Li gorî vê rewşê, mafê bikaranîna azadiya

xweîfadekirinê yê hin kesan dibe ku di hin rewşan de li gorî hinên din bêhtir bê sînordarkirin. Ji ber ku ev rapor, li gorî Raporên Çavdêriya li Medyayê ya bianetê hatiye nivîsîn, Ev rapor nirxandinê li gorî Raporên Çavdêriya li Medyayê Ev rapor, li gorî Raporên Çavdêriya li Medyayê yên bianetê hatiye amadekirin. Ji ber wê, tê de kesên fêdê ji azadiya xweîfadekirinê digirin, saziyên medyayê bixwe, kesên xwediyê van medyayane yan jî şîrket, bi wateyeke berfireh rojnameger, edîtor û berpîrsên weşanê yên giştî hene.

Di nava têgiha azadiya xweîfadekirinê de azadiya ramangêriyê, azadiya bidestxistina zanyarî û ramanên azadiya belavkirina zanyarî û ramanên heye. Li gorî vê rewşê, azadiya xweîfadekirinê tê wê wateyê ku, mirov bikaribin bi rengê azad nûçeyan, zanyariyan û ramanên

kesên din bibihîze, ji ber raman û nêrînên xwe neyê şermezarkirin û bi tena serê xwe yan jî bi hin kesên din re van tiştan bikaribe bilêv bike, rve bike, ji hin kesên din re ragihîne û belav bike.

Azadiya ramangêriyê, dema karmendekî/e dewletê bibe endamê/a partiyekê û ji ber vê ji kar bê avêtin<sup>12</sup> an jî wî nekin karmend<sup>13</sup> û di hin rewşên mîna vê de, angodema mirovek ji ber ramanên xwe yê nederbiriye û bi tenê xwediyê wan e tişteki neyênhi bê serê wî/wê, tê rojevê. Azadiya ramangêriyê, di Xala 25em a Destûra Bingehîn de hatiye diyarkirin û ji azadiya xweîfadekirinê ya Xala 26em cidatir e. Bi sazkirineke bi vî rengî re, ferq û cudahiyeke xistine nava ramangêriyê û azadiya xweîfadekirinê.

Azadiya bidestxistina zanyarî û ramanan jî, bi taybetî wan tiştan dixwe nava xwe de ku bidestxistina naverokên çapkirî, dengîn, dîtbarî û yê mîna wan ên saziyên medyayê û rojnameger ji civakê re radigihînin, bidestxistina naverokhen li ser înternetê belav bûne, bidestxistina navgînhên mîna pirtûk, rojname, kovar, radyo û televizyonan. Bi vê azadiyê re dixwazin, gel bikaribe nûçe û ramanên derbarê civakê de

bibihîze, temaşe bike û bixwîne, ev jî dide xuyakirin ku ev tişt ji bo pirînîparêziya demokratîk bivê nevē ye.<sup>14</sup> Mafê bidestxistina zanyarî û ramanan bi Xala 26em a Destûra Bingehîn hatiye parastin. Divê em li vir bibêjin ku mafê xwegîhandina zanyariyan du tiştên ji hev cida ne. Ya destpêkê gîhandina zanyarî û ramanên kesên aliyê sêyem ên ji bo raya giştî ye, ya duyem jî gîhandina hin zanyariyan di destê saziyên fermî de yê derbarê kesan an jî kesên sêyem de ye. Bidestxistina zanyariyan di Xala 74em a Destûra Bingehîn de weke mafekî cida hatiye saz kirin. Divê em diyar bikin ku rojnameger û saziyên medyayê di mijara bikaranîna mafê bidestxistina zanyariyan, de li gorî kesên din xwediyê hin îmtiyazan e.

Azadiya xweîfadekirinê herî zêde di belavkirina zanyarî û ramanan de diyar dibe. Di Xala 26em a Destûra Bingehîn de ev maf jî heye ku di vê xalê de mafê dibestxistina zanyarî û ramanan hatiye saz kirin. Têkildarî vê yekê, di Xala 27em a Destûra Bingehîn de îfadekirina akademîk û hunerî û di Xala 28em de jî azadiya çapemeniyê hatiye misogerkirin. Azadiya çapemeniyê ku aliyekî taybet ê mafê belavkirinê ye, girîngiyeke taybet tê dayîn ji

ber ku veguheztin û gerandina ramanê misoger dike û kes û civakê agahdar dike.<sup>15</sup> Lê dema ku em li Raporên Çavdêriya li Medyayê yê BIAYê dinêrin, em dibînin ku li dijî mafê belavkirina agahî û ramanan û îmtiyaza saziyên medyayê û rojnamegeran di çarçoveya vî mafî de pêkanînen berevajî hene û mixabin ev rewş berdewam e. Di nava 20 salan de tê dîtîn ku destwerdanên li hemberî organên çapemeniyê û rojnamegeran kêr nebûne, berovajî vê yekê zêde û dijwar bûne.<sup>16</sup>

Azadiya xweîfadekirinê hemû mafên derbirînê diparêze û ji hêla naverokê ve ev maf zêde nehatiye sînorkirin. Siyasî, hunerî, akademîk, bazirganî, olî, exlaqî û her cûre îfadekirin, di bin parastina vî mafê de ye. Nabe ramanekê ku hatiye aşkerikirin û belavkirin ji ber naveroka wê bi şêweyê “baş-nebaş”, “bikêr-bêkêr” bê cudakirin, ev ne li gorî azadiya xweîfadekirinê ye. Dema bi van nêrînên sîbjektîf, hewl bidin îfadeyên wê bikaribin sîdê ji azadiya xweîfadekirinê diyar bikin, wê bibe sedema ku vê azadiyê bi rengêkî kêfî sînordar bikin. Azadiya derbirînê di heman demê de azadiya îfadekirin û belavkirina ramanên ku ji hêla kesên din ve wekî “bênirx” an “bêkêr” têne hesibandin dihewîne..<sup>17</sup> Di Raporên Çavdêriya li Medyayê yê

BIAYê de tê dîtîn ku di daxuyaniyên di vê çarçoveyê de mudaxele li wan hatiye kirin de ti cudahî nayê kirin.

Lêbelê îro tê gotin ku divê azadiya xweîfadekirinê hin gotinan neparêze. Îro, bi taybetî li Ewropayê, her diçe zêdetir tê qebûlkirin ku gotinên nefretê yê wekî faşîzm, pîrozkirina îdeolojiya Naziyan, nîjadperestî, biyanofobî, antîsemîtîzm, îslamofobî û homofobî, cudakarî û propagandaya şer ji parastina azadiya derbirînê sîd wernegirin. Mimkun e ku sînordarkirina îfadeyên bi vî rengî wekî sînorkirineke “erênî” ya azadiya derbirînê were hesibandin. Dibe li hin xalên dibin bingeha midaxelekirina li azadiya xweîfadekirinê yê di hiqûqa Tirkiyeyê de ji bo hin rewşên ku gotinên refretkirinê tê gotin bê bikaranîn lê nehatiye dîtîn ku ramanên navborî hatine astengkirin û ceza li wan hatibe birîn. Di vê mijarê de gelek kêr mînak hene ku lêpîrsînnamê ji bo wan hatiye amadekirin û peyketin ii bo wan bûye lê ji bo wan jî biryara beraetê derketiye.

Parastina ji bo azadiya xweîfadekirinê pêk tê, her weha ji bo her cûre navgînan e jî ku bi van navgînan zanyarî û ramanên ziman û ragihandin û mirov bi rêya van



navgînan van raman û zanyariyan. Îfade dibe bi rêya televîzyon, radyo, înternetê, li bînayên fermî yên ji bo xizmeta civakê hatine veqetandin an jî li cihên taybet, li der û dorên sergirtî yan jî vekirî bi nivîs, daxwazname, greva birçîbûnê, daxuyaniya çapemeniyê, slogan, pirtûk, broşur, resîm, fîlmê sînemayê, berhemeke muzîkê, peyker û hwd bên aşkerekirin. Di xala 26em a Destûra Bingehîn de amûrên ku ji bo pêkanîna azadiya derbirînê û belavkirinê dikarin bên bikaranîn weke “peyv, nivîs, wêne an jî rêyên din” û bi hevoka “Rêbazên din” jî tê gotin ku hemû rê û rêbazên îfadekirinê di bin parastina destûrî de ne. Ji ber ku ev rapor li ser azadiya derbirînê ya saziyên medyayê û rojnamegeran disekine, bi giranî bal daye ser weşanên çapkirî, weşana înternetê, weşana radyo û televîzyonê.

Ji hêla navgînan ve girîngiyeke cida didin azadiya xweîfadekirinê û divê bê zanîn ku înterneta di 25 salên dawiyê de bêhtir ketiye nava jiyana me, qada herî zêde azadiya xweîfadekirinê tê bikaranîn e.<sup>18</sup> Ev rewşa ku em ji bo navgînan îfadekirin bi wan pêk tê, ji bo zimanên pê tê îfadekirin jî ye. Astengkirina îfadeyê ya bi zimanekî yan jî cezakirina di vê mijarê de,

dibe bibe sedema bînpêkirina mafê azadiya xweîfadekirinê.<sup>19</sup>

Li gorî baweriyê, azadiya xweîfadekirinê ji bo dewletan weke erkeke neyênî ye. Helbet erkeke neyênî ya dewletan heye ku vî mafî bînpê nekin. Dema mijar bibe azadiya xweîfadekerinê, divê dewlet tiştêkî nekin, dest nedinê, xwe ji vekişîne û tiştên mîna vê helwesteke “neyênî” hilgire. Lê belê helwesteke bi vî rengî di warê erkên mafan de têrê nake. Dema ku dor tê ser van azadiyan, hewce ye ku dewlet rêzek tedbîran bigirin, wek çêkirina rêkkestinên qanûnî di çarçoveya erkên erênî de, girtina tedbîrên îdarî ji bo hêsankirina bikaranîna van azadiyan û parastina kesan li hember destwerdana aliyên sêyemîn li dijî van azadiyan. Weke mînak ger kesek ji ber ku giliyê saziyeke fermî kiriye û nêrîna xwe diyar kiriye ji kar bê avêtin, di warê azadiya derbirînê de îhtimala bînpêkirinê heye.<sup>20</sup>

Li Tirkîyeyê di erkên erênî de misogeriya bingehîn Xala 5em a Destûra Bengihîn e ku ji bo armanc û karê esasî yê dewletê, dibêje “...aramî, aştî û bextewariya mirovan û civakê dabîn dikeye; astengiyên civakî, ekonomîk û siyasî yên li ber azadî û mafên bingehîn ên mirovan ên ne li gorî rêgezên dewleta hiqûqê

ya civakî û edaletê ne ji holê radike û ji bo hebûna madî û manewî ya mirovan pêşbikeve kar dike û şert û mercan ji bo van tiştan saz dike.” Ji xeynî xala 5em a di derbarê erka erênî ya ku di Destûra Bingehîn de, di warê azadiya derbirînê de derketiye pêş, rêzîknameyên din jî hene. Yek ji van jî rêzîknameya di paragrafa duyem a xala 28em a Destûra Bingehîn e ku li ser azadiya çapemeniyê ya “Dewlet ji bo azadiya çapemenî û agahdarkirinê tedbîran digire” ye. Dema em li Raporên Çavdêriya li Medyayê dinêrin, tê dît ku dewletê di warê bicihanîna erkên erênî de hema bêje tu tedbîr negirtiye, saziyên çapemeniyê û rojnamegerên ku azadiya îfadeyê bi kar tînin, gelek caran rastî şîdeta aliyên sêyemîn tînin. Heta tînin kuştin û ji kar tînin derxistin.

Destwerdanên muhtemel ên desthilatdaran ên li ser bikaranîna azadiya xweîfadekirinê, bi tenê dema ku li gorî rejîma sînorkirinê ya ji bo vê azadiyê têpêşbînîkirin, dikare rewa û li gorî hiqûqê bê qebûl kirin. Di vî warî de, di pratîkê de rêbazek ezmûnê ya bi navê “ceribandina sêalî” tê bikar anîn. Li gorî vê yekê, ji bo ku destwerdanek hiqûqî bê dîtî, divê destwerdanên li azadiya derbirînê tînin kirin, xwedî bingehîn hiqûqî bin (ji bo Tirkîyeyê divê ev qanûn be); pergala civakê

an jî parastina maf û navdariya hin kesên din bike armanc (ne gengaz e ku ji ber ti sedemek din were sînordar kirin ji bilî sînorkirinê ku di xalên têkildar ên Destûra Bingehîn de hatine destnîşan kirin); dema destwerdan ji bo zexteke pêwîstiya civakî be, destwerdan weke çareya dawî bê kirin û amûrên di mudaxaleyê de tînin bikaranîn jî li gorî armanca ku tê xwestin be.”

Her çend ev prensîb weke prensîbên berbiçav bin jî, ew çend pîvanên giştî ne ku dikarin werin sepandin ka destwerdanek berbiçav li azadiya derbirînê dibe bibe sedema bînpêkirinê an na û ne formûlek matematîkî ne. Di her rewşeke şênber de yên ev prensîb li wan bînan sepandin, îhtimal e, encamên cuda derkevin holê. Nasnameya kesê daxuyaniyê dide yan jî ya muxataban; cih û dema ku daxuyanî lê hat dayîn; îfade çiqas berbelav dibe; Naverok, şewaz û çarçoveya vegotinê dikare di diyarkirina sînoren azadiya azadiya xweîfadekirinê de roleke girîng bilîze. Ji bilî îstîsnayên li jor (nîjadperestî, cudakarî, propagandaya şer, axaftinên nefretê û hwd.) azadiya xweîfadekirinê her cure îfadeyan dihewîne, divê were zanîn ku hemû îfade ji aliyê kesan ve bi wekhevî nayên parastin. Wek mînak, rexnekirina siyasîmedar

û karbidestên dewletê dibe ku bêhtir bên parastin, lê rexneya li hemwelatîyên ji rêzê û dezgehên dadwerî dikare kêmtir bên parastin.

Ji van tiştan xuya dibe ku di her rewşê de formûleke hiqûqî ya amade tune ku lêbinêrin bê maf hatiye bînpêkirin an na. Lêbelê, ev nayê wê wateyê ku di azadiya xweîfadekirinê de keyfîtiya mutleq heye û ev nîşan dide ku sînordarkirin tenê di rewşên awarte de gengaz e. Hiqûq û pîvanên ku heta niha di hiqûqa navneteweyî de derketine, ne tenê rêyan nîşan dide bê ka qanûnên qanûnî yên razber di rewşên berbiçav de çawa têne sepandin, lê di heman demê de tekez dikin ku divê azadiya derbirînê bi berfirehî were şîrovekirin. Ya esasî azadiya derbirînê ye, sînorkirin îstîsna ye. Helbet ev di serî de ji bo saziyên medyayê û rojnamevanan derbas dibe.

## II. Aktorên di sînordarkirina azadiya xweîfadekirinê de derdikevin pêş

Midaxeleyên li bikaranhina mafê azadiya xweîfadekirinê her diçe bêhtir dibin cihereng. Bi pêşketinê di teknolojiyên ragihandinê re, ligel şeweyên midaxelekirinê yên kevn, şeweyên midaxelekirinê yên nû jî derdikevin. Heman tişt ji bo kesên ku midaxeleyê dikin jî rast e. Mînak, berê dewletan bêhtir midaxele dikirin. Îro midaxeleyên ku aktorên ne dewlet in jî bandoreke mezin li ser azadiya xweîfadekirinê dikin. Berê midaxeleyên ku aliyên sêyem ên ji derveyê dewletan dikirin, ji bo azadiya xweîfadekirinê nedibû sedema pirsgerêkên mezin lê êdî ev jî weke pirsgerêkên tîn qebûl kirin. Ji ber ku him dewlet him jî aktorên ji derveyê dewletan midaxeleyê azadiya xweîfadekirinê dikin, ji bo parastina vî mafî divê bergiriyên hiqûqî ji bo her dû rewşan jî bêtêmasî pêk bînin.

Hin caran rewşên wisa çêdibin ku him dewlet him jî aktorên ji

derveyê dewletan midaxele dikin. Em dikarin dozên tazmînatê yên sazî, şîrket û mirov li gorî hiqûqa taybet li dijî kesên ku mafê azadiya xweîfadekirinê bikar anîne vedikin weke mînakê vê mijarê bidin. Yan jî di piştî gilîkirinê dozger dest bi kar û baran dikin û dozên cezakirinê vedikin, ev jî weke mînakê vê rewşê ne. Di mudaxeleyên bi vî rengî de, kesên xwezayî an hiqûqî yên hiqûqa taybet û saziyên dadwerî bi awayekî nerasterast tevdigerin û dibin sedema destwerdanê. Dema mirov li Raporên Çavdêriya Ragihandinê ya BIAYê mêze bike, tê dît ku hemû aktorên navborî di mudaxeleya azadiya ramanê ya li Tirkiyeyê de çalak in.

Diyardeya girîng a ku ji ber destwerdanên dewlet an jî hêzên ne-dewlet pêk tê, otosansur e. Di vê rewşê de kesên ku naxwazin bi ti mueyîdeyan û zextan re rû bi

rû bimînin nikarin ramanên xwe bi serbestî bînin ziman û tercîh dikin ku di nav sînorên li ser wan hatine ferz kirin de bixebitin.

## Yasadanîn

Destwerdenên ku çavkaniya xwe ji dewletê digirin ên li ser azadiya xweîfadekirinê, dibe ku çavkaniya xwe ji yasadanîn, hikûmet an jî darazê bigire. Aktorê yekem saziya yasadanînê ye. Ew bi çêkirina hin yasayên li ber bikaranîna azadiya xweîfadekirinê dibin asteng vî karî dike. Yan jî hin yase hene ku ji bo bikaranîna azadiya xweîfadekirinê dibin asteng, ev demeke dirêj e tê zanîn lê saziya yasadanînê ti karî ji bo guhertina van tiştan nake. Ev jî hêleke din e. Ango saziya yasadanînê bi du şêweyan midaxele dike, yek jê bi şêweyê pêkanîne yek jî îhmalkirinê pêk tê.

Yek ji sedemên destwerdana li azadiya derbirînê jî nezalaliya rêzikên qanûnî ye. Nezelalî, bi taybetî dihêle ku rayedarên dewletê bi rengekî berfireh biryarên şexsî di van rewşan de bidin û zehmet dibe ku dadresî van biryarên di vê çarçoveya nixandinên şexsî de tene girtin, kontrol bike. Divê rêziknameyên yasâ yê derbarê azadiya xweîfadekirinê de bi zelalî

werin saz kirin kirin da ku mirov bikaribe ramanên xwe li gorî rêzikên yasayî bêje û van bigihîne her kesî. Ji bo dezgehên dadwerî û îcrayê yê ku xwedî hêz in ku destwerdanê li azadiya derbirînê bikin jî zelaliyek bi heman rengî pêwîst e.

Her çend ne bi heman şêweyî be jî hin xalên Yaseya Cezayê ya Tirkan, gelek xalên Yaseya Têkoşîna Li Dijî Terorê, Yasaya Rêziknameya Weşanên Li Înternetê tînin kirin û Têkoşîna Li Dijî Sûcên Bi van Weşanan tînin kirin, di warê organên medyayê û rojnamevanan de li Tirkîyê Yaseya Damezrandin û Weşana Radyo û Televîzyonan çavkaniya bînpêkirinan di warê azadiya derbirînê de ye.

Li Tirkîyeyê gelek yasa û rêzikname hene ku dibin sedema bînpêkirina mafê azadiya xweîfadekirinê û bi taybet jî azadiya çapemeniyê. Em dikarin di nava wan de bi taybet navê van yasayan û rêziknameyan bidin:

- Yaseya Çapemeniyê (Hejmar 5187, 09.06.2004)
- Yaseya Daraziyê ya Cezayan (Hejmar 5271, 04.12.2004)
- Yaseya Derbarê Sazkirina Weşanên bi Rêya Înternetê Tînin Kirin û Têkoşîna bi Sûcên bi Rêya

Van Weşanan re Tînin kirin de (Hejmar 5651, 04.05.2007)

- Yaseya Derbarê Saziyên Radyo û Televîzyonê û Xizmetguzariya Weşanan de (Hejmar 6112, 15.02.2011) <sup>21</sup>
- Yaseya Dijterorê (Hejmar 3713, 12.04.1991)
- Yaseya Civîn û Meşên Xwenîşandanê (Hejmar 2911, 06.10.1983)
- Yaseya Cezayan a Tirkan (Hejmar 5237, 26.09.2004)

## Hikûmet û Rêveberî

Aktorê duyemîn ê destwerdanên li ser bingehe dewletê, hikûmet an jî bi giştî rêveberî ye. Herçiqas jî cîbicîkirina destûr û yasayan berpirsiyar bin jî, lê dikarin bibin sedema destwerdanên girîng di azadiya azadiya xweîfadekirinê de. Dezgeha îcrakar dikare bi rêgezên birêkûpêk ên giştî yê wekî rêziknameyan kiryarên takekesî yê ku li dijî kesan derdixe, mudaxele yî azadiya derbirînê bike. Mudaxele yê wiha gelek caran keyfî ne. Rêveberî dibe ku bi bînpêkirina eşkere ya rêzikên yaseyî yan dema ku rêziknameyên qanûnî

bi tîra xwe azadiya xweîfadekirinê neparêze yan jî ji ber ku rêzikên yasayî nezalal in, rê dide rêveberiyê ku bi rengekî kêfî tevbigere û destwerdanê bike. Ev rewş nîşan dide ku pêdivî bi rêziknameyên yasayî yê li ser azadiya xweîfadekirinê bi rêkûpêk bi rê ve bibin ku cezayên berbiçav û bibandor ji bo misogerkirina wê azadiyê pêk bînin. Çawa ku li jor me ji bo saziya yasadanînê got, em dikarin ji bo midaxele yê rêveberiyê jî bibêjin ew jî bi du şêweyan derdikevin holê, yek bicihanî û yek jî ji ber îhmalkariyê. Dema aktorek ji nava aktorên ne-dewletê midaxele li azadiya xweîfadekirinê bike û rêveberî vê bizanibe yan jî nizanibe lê derfetên wê yê zanîne hebin lê kesên azadiya navborî bikar tînin bi qasî hewce dike neparêze, ev îhmalkarî ye û em dikarin vê ji yek mînakên herî berbiçav ên midaxeleyan ev e. Em dikarin van mînakên bidin ku bê ka hikûmet û rêveberî çawa midaxele yê li saziyên medyayê û rojnamegeran dikin:

- Gefxwarin an jî tacîzên hikûmet an jî rêveberî dikin;
- Tundkariya laşî ya rêveberî dike;
- Rêveberî di pratîkê de asteng bike;

- Hikûmet an jî rêveberî biryara girtinê yan jî destdanînê bide, weşanan qedexa bike, daxwazê ji Saziya Ragihandin û Teknolojiyên Zanyariyan (BTK) bike ku naverokan rake û/an jî lînkên asteng bike, di pratîkê de asteng bike;
- BTK biryara astengkirina lînkên bide, biryara rakirina naverokan bide û cezayê pereyan bide;
- Saziya Bilind a Radyo û Televîzyonan (RTUK) cezayê hişyariyê bide, bernameyan bide sekinandin, cezayê pereyan bide, weşanê ji bo demekê bide sekinandin, lîsansê betal bike.<sup>22</sup>
- Saziya Îlanan a Çapemeniyê îlanan nede an jî dayîna îlanan bibire.<sup>23</sup>
- Serokatiya Ragihandinê ya Serokomariyê kartên çapemeniyê ya rojnamegeran betal bike û yên nû nede wan.<sup>24</sup>

## Daraz

Di mudaxeleiyên dewletê de aktorê dawî daraz e. Beşek girîng a destwerdanên li dijî azadiya ramanê ya li Tirkiyeyê ji aliyê darazê ve tê kirin. Saziyên dadweriyê yên ku ji parastina azadiya xweîfadekirinê berpirsyar in, di encama van mudaxaleyan de dibin aktorên herî girîng ên binpêkirina azadiya ramanê. Saziyên dadweriyê ji bo kesên ku mafê xwe yê azadiya xweîfadekirinê bikar tînin midaxeleyê li ber wan nebin astengî him jî li diî aktorên ne-newlet ew bînin parastin, divê bi baldarî tevbigerin. Derbarê destwerdanên darazê

yên li hemberî saziyên medyayê yan jî rojnamegeran de em dikarin van mînakên bidin:


- Biryarên tazmînatê yên dadgehên hiqûqê di dozên tazmînatê de didin; betalkirina peymanên karkirinê li gorî hiqûqê bê dîtin, ji bo axavtîna bi heman rengî neyên kirin biryarên tedbîra hişyarkirinê;
- Lêpîrsînnameyên dozgeriyên komarî, biryarên desteserkirinê; daxwazên girtinê, daxwazên kontrola edlî, biryara taloqkirina vekirina dozên civakî, biryarên astengkirina gîhandinê, vekirina dozên cezakirinê;
- Biryarên astengkirina gîhandinê yên dadweriyên aştî û cezayan, biryarên derxistina naverokan a ji weşanan, biryarên tekzîbê, biryarên girtinê, biryarên kontrola edlî, biryarên berhevkirin û destdanînê, guhdarkirina ragihandinê;
- Destpêkirina dadgehkirinê ya bi qebûlkirina îdianameyan a ji hêla dadgehên cezakirinê, biryara girtinê/biryara berdewamiya rewşa girtîtiyê, girtin, cezayê pereyan ê resmî, cezayên mîna mehrûmkirina ji hin mafan,

biryara taloqkirinê, biryara taloqkirinê ya aşkerekirina biryarê, biryara taloqkirinê ya peyketinê, biryara astengkirina gîhandinê.

Divê bê zanîn ku, her çend lêpîrsînname ji bo kesekî/e mafê azadiya xwe ya îfadekirinê bikar aniyê bê amadekirin midaxeleya li azadiya xweîfadekirinê ye. Ti dixwazî bila di dewama wê de doza cezakirinê nehatibe vekirin jî. Dibe ku ev bibe sedema sansurê yan jî otosanurê.

Midaxeleyên saziyên dadweriyê yên di warê hiqûqa cezakirinê de, di nav destwerdanên herî dijwar ên azadiya xweîfedekirinê de ne. Ji bo xwendevanên nehiqûqnas, hûrguliyek piçûktir li ser destwerdanên weha dê raporê bêtir fêhm bike. Yekem ji midaxeleyên dadwerî yên di warê hiqûqa cezakirinê yên derbarê azadiya xweîfadekirinê de vekirina lêpîrsîna sûcan ji aliyê dozgerên komarî ve bi hinceta sûc hatiye kirin. Lêpîrsîna tawanên dikare ji aliyê Dozgeriya Komarî ve bi erka xwe, di encama îdiakirin an gîlîkirinê de, ji ber hînbûn, giliyek ji hukûmetek biyanî, an jî li ser daxwaza wezîrê dadê were destpêkirin. Di dawiya lêpîrsîna ku hat kirin de dibe ku

### Istatîstîkên derbarê cezayên pereyan yên fermî yên di raporên RTUKê de hatine weşandin



Ev dane ji raporên Xebatên Salane yên Saziya Bilind a Radyo û Televîzyonan hatine berhevkirin.



dosyaya sûc bê vekirin an jî bi biryara ku cihê dozgeriyê tine ye doz neyê vekirin. Tevî vê yekê jî, rastiya ku lêpîrsîn hatiye destpêkirin bi serê xwe destwerdanek li azadiya derbirînê ye, ji ber ku bi ihtimaleke mezin ev destwerdana navborî dê bandorek asteng bike li ser kesên ku vê azadiyê bikar tînin.

Saziyên dadweriyê mirovan desteser dikin û digirin û ev jî yek ji şêweyên midaxelekirina li azadiya xweîfadekirinê ye. Her çend di yase û rêzîknameyan de hatiye diyarkirin ku dema desteserkirinê di navbera 24 saet û 96 saetan de ye jî, kesên tînin desteserkirin, ji azadiya xwe mehrûm tînin kirin. Ihtimaleke mezin ev pêkanî bandorê li ser kesên ku mafê azadiya xweîfadekirinê bikar tînin bike û vî mafê bikar neynin. Mirovên ji ber ku mafê xwe yê azadiya xweîfadekirinê bikar aniyê bînin desteserkirin, ev midaxele ye li mafê azadî û ewlehiya şexsan û her weha li azadiya xweîfadekirinê ye. Mîna hemû midaxeleyên li azadiya xweîfadekirinê, divê weke çareya dawî serî li tedbîreke bi vî rengî bidin. Mînak, dema bixwazîna îfadeya kesekî/e ku lêpîrsîname ji bo wî/wê hatiye amadekirin bigirin, divê destpêkê bang lê bê kirin. Ev ye rêbaza herî rast. Girtin ne şêweyekî cezakirinê ye lê tedbîreke

û dema hin şertên diyar derkivin holê divê serî li vê tedbîrê bidin. Girtin, di dadgehkirinên cezakirinê de, girantirîn tedbîra parastinê ye û dibe sedem ku heta saziyên dadweriyê biryara dawiyê bidin, ew kes jî azadiyê bêpar dimîne. Li Tirkiyeyê mirov demên dirêj girtî dimînin, ev jî dike ku dihêle ku girtin ne weke tedbîrê lê bibe weke amûreke cezakirinê. Girtin, bi vî rengî, yek ji şêwazên destwerdanê yê sereke ku herî zêde bandorê li azadiya xweîfadekirinê dikin. Her weha di rewşên dadgehkirinê girtî pêk tînin de, bikaranîna azadiya xweîfadekirinê, tevî bandorlêkirinê dibe ku di pratîkê de bidawî jî bibe. Li Tirkiyeyê ji bilî pîrsgirêkên giştî yê derbarê girtinan de, bi taybet ji bo sûcên têkildarî "terorê"ne, demên dirêj ên girtinê û dadgehkirinê, pêkanîneke berfireh e. Her wiha di van salên dawî de sûcê heqareta li Serokkomarî (QCT, xala 299ê) bûye cureyekî sûcan ê ku gelek caran ji bo tedbîra girtinê serî lê didin.

Piştî ku lêpîrsînên serdozgeriyên komarî dane destpêkirin, dozan vedikin, dozên cezakirinan jî dest pê dikin. Ti şik tune ye ku gefa zindanîkirinê yan jî cezayên din dê bandorek neyînî li ser kesên ku dixwazîna azadiya xwe îfadekirinê bi kar bînin, bike. Ev dozên ku daraz

wan birêve dibin, midaxeleyeke cidî ya li azadiya xweîfadekirinê ne. Helbet weke lêpîrsînên ku Serdozgeriyên Komarî wan birêve dibin, di dozên cezakirinê de jî ihtimala beraeta bersûcan heye. Lêbelê, hebûna dozêkê bi xwe jî dikare bandoreke neyînî li ser bikaranîna xweîfadekirinê bike.

Dozên cezakirinê yê li dijî kesên azadiya xweîfadekirinê bikar anînin tînin vekirin, dibe ku caran bibin sedema cezakirinan. Di encama cezakirinan de, cezayê girtîgehê, dikin cezayê pereyan. Cûreyeke din a cezakirinan jî tê rojevê ku ew î cezayên alternatîf in. Li gorî xala 50yê ya QCTyê, cezayên demkurt ên girtîgehê, li gorî kesayetiya kesê/a ceza lê hatiye birîn, li gorî rewşa wî/wê ya civakî û aboriyê, bê ka di dema dadgehkirinê de poşman bûye yan na û taybetmendiyên di dema sûckirinê de, car caran vediguherînin cezayên pereyan car caran jî wî/wê kesî/ê di karekî de didin xebitandin ku ji bo berjewendiya civakê ye ew kar.

Di dozên tawanana de, di hin rewşan de, piştî mehkûmkirina kesê, dibe ku biryar were dayîn ku ragihandina biryarê (HAGB) were taloqkirin an jî ji bo hin heyaman were paşxistin. Ji bo kesên ku biryara HAGB'ê wan hatiye dayîn an jî cezayê wan

hatiye taloqkirin, dema çavdêriyê tê diyarkirin. Di biryara taloqkirinê de mehkûmî heye lê ceza nayê dayîn. Di HAGB'ê de hêj biryar nehatiye ragihandin û biryara mehkûmkirinê jî nehatiye dayîn.

Lê di rewşên ku ew kes di heyama teftîşê de bi qestî sûc bike yan jî tevî hişyariya dadwer bi îsrar li ser cîbicîkirina erkên ku li ser wî hatine ferzkirin bi îsrar be, cezayê ku ragihandina wî hatiye taloqkirin tê ragihandin an jî cezayê taloqkirî bi qismî yan jî bi temamî tê îcrakirin. Ji ber vê yekê, di doza HAGB an taloqkirinê de cezayek heye. Mecburiyeta ku di heyama teftîşê de bi reneki diyar tevbigerin, ji bo kesên ku dixwazîna azadiya xwe ya derbirînê bi kar bînin, otosansurê bi xwe re tîne û bandorek eşkere ya astengkirinê li ser wan dike.

Ev mînakên ku hatine dayîn hemû jî derbarê midaxeleyên saziyên darazî dikin de ne. Saziyên dadweriyê bi taybet jî dozgerî, mîna saziyên yasadanîne û hikûmetê yan tevnişkerin yan jî lêpîrsîneke bibandor li ser midaxeleyên aktorên ne-dewlet in nake yan jî biryaran didin ku hewce nake peyketin pêk bê, rasterast yan jî nerasterast dibin berpîrsîn bîndarîkirinên azadiya xweîfadekirinê yê îhmalkar.

## Aktorên ne dewletî

Aktorên ne dewletî, berevajî destwerdanên dewletê, cihêrengiyê peşkeş dike. Dezgehên ragihandinê, rêxistinên sîvîl, kes û civak wek aktorên nedewletî yên destwerdana azadiya derbirînê dikin balê dikişînin. Weke ku li jor jî hatiye gotin, parastina kesên ku azadiya xwe ya derbirînê li hemberî destwerdanên aktorên bi vî rengî bi kar tînin yek ji erkên herî bingehîn ên azadiya derbirînê ye. Dema mirov li Raporên


Çavdêriya Li Medyayê yên BIAyê temaşe dike, mirov dikare bibêje pêkane ku mînakên li jêr ên destwerdana di van 20 salên dawî de gelek caran li dijî dezgehên çapemeniyê an jî rojnamegeran derketine holê.

Mînakên destwerdanên aktorên ne-dewletî ev in:

- Midaxeleya fizîkî ya li dijî rojnamegeran an go pêkanîna tûndkariyê li dijî rojnamegeran;

- Tehdîdkirin û tacîzkirina rojnamegeran;
- Mudaxelekirina naveroka nûçeyan an şîroveyan rojnamevanan, guhertinên di naveroka nûçe an şîroveyan de bêyî rizamendiya wî kesî, nehiştina weşana nûçe û şîroveyê;
- Vekirina doza tazmînatê ya li dijî rojnamegeran ji aliyê siyasetmedaran an kesên din ve;
- Astengkirina fîlî ya belavkirina nûçe û şîroveyan rojnamegeran bi raya giştî re;
- Daxwaza astengkirina naverok û nûçeyên rojnamegeran;
- Ji kar derxistina rojnamegeran.

Sal bi sal hejmara rojnamegerên ku ji kar hatine derxistin



Ev dane ji Raporên Çavdêriya Li Medyayê yên BIAyê hatine berhevkerin.

### III. Dîmenên ku di sînardarkirina azadiya derbirînê de derketine holê

#### Midaxeleyên di çarçoveya hiqûqa cezê de derketine hol

##### “Têkoşîna li dijî terorê”

Têgeha ku herî zêde li Tirkiyeyê di astengkirina azadiya derbirînê de derdikeve pêş, “têkoşîna li dijî terorê” ye. Tê dîtin ku di Raporên Çavdêriya li Medyayê ya 20 salên dawî de sedema herî girîng a sînardarkirina “têkoşîna li dijî terorê” ye. Lêbelê, sedem çî dibe bila bibe, divê ew sînardarkirinên ku li ser azadiya derbirînê bêne danîn, bi pergala sînardarkirina giştî ya ku li jor hatî behs kirin re hevaheng be. Têgîna “têkoşîna li dijî terorê” divê wekî kontrolek vala neyê şîrove kirin ku ji bilî rejima rêgirtinê rayeyên bêsinor dide rayedarên giştî ku sînardar bikin. Têgînen wekî “terorîzm”,

“rêxistina terorê”, “endamtiya rêxistina terorê”, “propagandaya rêxistina terorê” divê di qanûnê cezayî de heta ku dibe bila bibe bi aşkere, zelal û midaxeleya nehewce yan jî bênavber li azadiya derbirînê were diyarkirin. Divê di çarçoveya van têgehan de destûr neyê dayîn.<sup>25</sup> Divê rêzîknameyên qanûnî bi awayekî ku rê nede pêkanînen keyfî were amadekirin û di vê rewşê de kes dikarin berpirsiyariya sûc pêşbîn bikin.

Rêzîknameya bingehîn a li ser têgeha “têkoşîna li dijî terorê” ya li Tirkiyeyê Qanûna Dijî Terorê (TMK) ye. Ji sala 1991ê ve ku qanûn ketiye meriyetê, di warê mafên mirovan de bûye armanca rexneyên cidî û mafdar û rastî gelek guhertinan hatiye. Ev guhertin guhertinên di nêzikatiya têkiliya di navbera têkoşîna li dijî terorê û mafên mirovan de eşkere dike û bandorên erênî û neyînî yên

girîng li ser sînardarkirina azadiya derbirînê dike. TMK di heyama 20 salan de 40 caran guheriye. Ev tê wê wateyê ku Zagon bi navînî salê du caran tê guhertin. Her wiha beşeke girîng a van guhertinan beriya an jî piştî Rewşa Awarte ku di navbera salên 2016 û 2018’an de li seranserê Tirkiyeyê hate pêkanîn, pêk hatin. Ev nîşan dide ku Rewşa Awarte tenê du salan dom nekir, û nêrînek bi vî rengî di demên asayî de demek dirêj serdest bû.

Di Xala 1em ya TMKyê de têgeha terorîzmê hatiye pênasekirin ku pênaseya wê hê di hiqûqa navneteweyî de nîne.<sup>26</sup> Li gorî pênaseya navborî, her kiriyarek ku bibe tawanek ku ji aliyê kes an kesên endamên rêxistinê ve bi bikaranîna hêz û tundûtûjiyê ji bo bidestxistina armancên diyarkirî bi rêbazên diyarkirî, wekî kiriyarek terorîstî tê hesabandin. Li aliyê din, huner. 2 tertîb dike ku kesên li ser navê rêxistinê sûcan dikin jî heke endamên rêxistina terorê nebin jî wek sûcdarên terorîst tînen hesabandin.

Di xala 7/2 ya TMKyê de rêzîknameya herî gelemperî di çarçoveya azadiya derbirînê de sûcê “propagandakirina rêxistina terorê” ye: “Têgînen ‘meşrûkirin’, ‘pesandin’ an ‘teşwîqkirin’ têgehên gelekî nezelal

